


# Materyalên nû ji bo qesîdeyek Melayê Cizîrî

Mustafa Dehqan  
Werger ji Îngilîzî: Resul Geyik

Destxeta ku ‘aidî sedsala XVIIyê mîladî ye, di nav rûpelên xwe de 32 helbestên Farisî yên helbestvanên navdar ên wekî Saibê Tebrîzî, ‘Urfî, Hafîz, Camî, Xusrewê Dehlewî, Qasim Enwer, Murşîd, Kîşweriyê Xelxalî, Kelîmê Hemedanî, Hilalî, Wehşî û hwd dihevine.



**E**v wereqên ku ez pêşkêşî we dikim, ji destxeta Jungê ya bêhempa û girîng e ku Prof. Dr. Danişpejûh di “Fihrist-i Dānîshgāh”ê de danasîna wê dike û dibêje ku di sedsala XIyê hicrî<sup>1</sup> de bi xettê neste’lîqa çelîpayê hatiye nivîsîn. Destxet di koleksiyonê de di jimara 3765an de cî digre û ebatên wê jî 20x10 cm. ne. Destxeta ku ‘aidî sedsala XVIIyê mîladî ye, di nav rûpelên xwe de 32 helbestên Farisî yên

helbestvanên navdar ên wekî Saibê Tebrîzî, ‘Urfî, Hafîz, Camî, Xusrewê Dehlewî, Qasim Enwer, Murşîd, Kîşweriyê Xelxalî, Kelîmê Hemedanî, Hilalî, Wehşî û hwd dihevine. Ev ne berhemeke îstînsaxkirî ye, mecmueyeke helbestan e ku ji bo kesayetekî girîng hatiye amadekirin. Hatiye îfadekirin ku ji bo amadekirina wê gelek destxet hatine komkirin û sûd ji wan hatiye wergirtin. Tu destpêk ji bo vê destxetê tune ye, lê wereq/rûpelên ewil (2r.-4v.) bo dema xwe û îstînsaxkirina “mecnû’e”yê delîlên ewil in.

1 See (Dānîshpazhūh 1961, xii, 2755; Dirāyatī 2010, iii, 876).

Berhevkarê nediyar, mecmû'eya xwe ya ku bi helbest û gotinên 'arifane tije kiriye cih daye qesîdeyê Melayê Cizîrî (k.d. 1640) jî. Navê Mela di vir de bi şiklê "Şêx Ehmedê Cizîriyê Kurd" derbas bûye.

Tiştê ewil, berhevkarê vê mecmû'eyê derheqê edebiyata Kurdî de xwedî çî agahî û zanebûnê ye em jê ne haydar in. Lê xuya ye ji ber ku di koleksiyoneke Farisî de behsa qesîdeya wî dike, teqez ew di bin bandora Cizîrî de maye û li hemberî helbest û fikrên wî yên filozofî îma hene, hinek ji wan veşartî ne û gelekên wan jî vekirî ne. Bandora Cizîrî li ser berhevkarê nediyar, ne tişteki veşartî ye.

Rûpelên ku li ser tîna axaftin, tîna xwe agahî di derheqê ku berhevkar çî cure însan e nahewîne. Bi taybetî, ev agahî îspat nake ku mirov bibêje ev kes Faris e an jî ne Faris e. Bi rastî zehmet e ku mirov bikare bêje ev rûpelana fikir, nêrîn û peyvên berhevkarî çiqas bi rastî nîşan didin. Dibe ku hinek xebatên kevntir di refêke pirtûkxaneyekê de bê bîdestxistin. Lê heya wê dema îhtîşamî, pêwîst e ku em derheqê berhevkar de bê deng bimînin û tenê biryara pêşniyazkirina Cizîrî wek helbestvanek di dema xwe de xwediyê navdariyek mezin e, bidin. Elbet, dîtina taybetmendiyên helbestên Cizîrî ji nêrîna çavekî Faris ne tenê si'ûdek e, heke mirov navdariya Cizîrî ya bihêz û hema hema bêminak û navdariya wî ku ji Botanê gihastiyê welatê Farisan di sedsala hîvdehan de bifikire, ev zehf balkêş e.

Delîla duyem ji bona girîngiya van ewraqên ku em danasîna wan dikin, xwazî bi nêrîneke mutleq an jî nisbî bê nîrxandin ji metnê qesîdeya ku di destê me de ye, derdikeve holê. Her çiqas çapên serkeftî yên wek ya xebata Zivingî ku li ser Dîwana Cizîrî hatibe çêkirin hebin jî, nusxeyên hê ku nehatine peydakirin ku rojekê bêne dîtin, hêvî heye ku dê ji bo fêmkirina vê dîwanê derfetên baştir bide destê me. Tiştê ku meriv balê bikşîne ser eve ku, qesîdeya ku mijara vê nivîsê ye di çapên heyî de bi guhertoyên biçûk hatiye tomarkirin.

Qesîde hinek ji çapên di destê me de cûda dixuyê. Li vê derê transkripsiyona qesîdeyê bi vî şiklê di destxetê de ye:

### Şêx Ehmed Cizîrî Fermayed

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed  
Wahidek ferd e bi zatê xwe û nîyin çu 'eded

Di qîdem da ezel û 'eynê ebed herdu yek in  
Sermediyyet we dixwazit ne ezel bit ne ebed

Ferq e wahid ji ehed, lê di meqamê semedî  
Bi heqîqet ku yek in herdu, çî wahid çî ehed

Yek e derya tu bizan qenc-i çî mewc û çî hebab  
Di esil da ku hemî av e, çî av û çî cemed

Aftabê ehediyyet di xwe da girtiye kewn  
Neko 'ewrek heye lê girtiye çêvên me remed

Husn û zatê but û latan ji cemala semed e  
Li mîsalê senemê we ko tecella ye semed

Xeyrê derya niye sehra bi heqîqet emma  
Ji rûyê keyf û kemmê av e bûwî şubhê zebed  
"Kullu yewmîn huwe fî şe'nîn" nebî xafil-i jê  
Her peyapey ji şu'ûnan dikirit feyzê meded

Ger di Adem bîdiya sîrrê 'ilim<sup>2</sup> Iblîsê  
Hînema ebserehu kebbere hînen we seced

Çî zeman û çî mekan û çî cihat in çî hudûd  
Çî meqadîr û tefasîl û hisab in çî 'eded

Çî munafatê luzûm in çî qîyas û çî misal  
Ev çî tewlîd e çî terkîb e çî rûh in çî cesed

Ser bi 'icze didirit quwwetê derrakeê ma  
Rece'e l-'eqlu kelîlen we meta qame qe'ed

Hîret û 'icze serencam-i di babê nezerê  
Key bi xaliq nezerê qasîrê mexlûq-i resed

Guftûgo çend-i Meļa me'rifetî peyda ke  
Gewhera me'rifetê nagihetê kes bi xired

### Çavkanî:

-al-Buhtî al-Zivingî, Ahmad b. al-Mullâ Muhammad. *al-Iqd al-Jawharî fî Sharh Dîwân al-Shaykh al-Jazarî* (Istanbul: al-Maktabat al-Hâshimîyya, 2012).

-Dânişpazhûh, Muhammad Taqî. *Fihrist-i Kitâbkhâna-yi Markazî-yi Dânişgâh-i Tihîrân* (Tehran: University of Tehran Press, 1961).

-Dirâyati, Mustafâ. *Fihristwâra-yi Dastniwisht-hâ-yi Îrân* (Tehran: Kitâbkhâna, Mûza wa Markaz-i Asnâd-i Majlis-i Shawrâ-yi Islâmî, 2010).